

MAFÊN WE YÊN DIJÎ ŞÎDETA DI NAV MALBATÊ DE

Tedbîrên polîsî,
derfetên parastinê
yên ji aliyê huqûqa
şarwerî û ya cezayê
giran



BIG KOORDINIERUNG

Dijî şideta li nav malbatê - alîkarî ji bo jin û zarokan

Kurdisch

BIG e.V.

BIG HOTLINE

BIG KOORDINIERUNG

BIG PRÄVENTION

Durlacher Str. 11 a
10715 Berlin
Telefon 030-6170 9100
Telefax 030-6170 9101
mail@big-koordinierung.de
www.big-koordinierung.de
Berlin, 2014, çapa 1. an

Ji bo alîkariya giranbuha ya di weşana vê namilkê de, spasdariya xwe pêşkêşî Senatsverwaltung für Arbeit, Integration und Frauen dikin.

Weşanger: www.big-berlin.info

Şîdeta li ser jinan, zêdetirîn di nav çar dîwarên me yên qaşogiravî ewle de, “di nav malê de” pêktê.

Li Almanyaya ji her çar jinan yek, hemberê şîdeta li nav malê, bi gotineke din, di bin şîdeta pir cure ya bedenî an jî cinsî dinale. Ev şîdet, ji aliyê mêrê wan yê nuha an jî yê berê pêktê. Ev rastî, encama lêpîrsîna temsîlî ya Wezareta Malbat, Pîr û Kal û Ciwanan a Almanyaya Federal e, ku di sala 2004'an de bi 10.000 kesan ve hatiye kirin. Yê ku şîdetê bi kar tînin, pîranî zîlam in û qurbanî, hin caran ji sedema vê şîdetê bi giranî birîndar dibin.

Hin caran zîlam jî dikarin bibin stembarên şîdetê. Lê şîdeta ku li ser zîlamên pêk tê, pîranî ji aliyê zîlamên din û bi awayekî eşkeretî tê meşandin.

Ji her dudo bûyerên qewimî, bi dîya xwe re zarok jî para xwe werdigrin. Bê guman ev tiştên ku zarok bi wan rû bi rû dibin, her dem zirarê dide mafê yasayî yê zarokan, ku divê ew di nav aramiyê de bi rehetî mezin bibin. Bûyerên şîdetê ku zarok bi wan mezin dibin, dikarin ji aliyê têgihîştina bedenî, bîrayî, giyanî û civakî ve bandoreke pir giran ya neyîni li ser wan bikin. Li hin caran, wek mînak; ger şîdet tundtir hatibe bi kar anîn û zarok jî di temenekê piçûk de bin, di wan de zîyanên travmatîk derdikevin holê. Ji ber vê yekê jî, di leztirîn wextê de ji holê rakirina şert û mercên şîdetê û pêk anîna tedbîrên parastinê yê berfireh, ji bo jin û zarokan pir giring in.

Ger hevjiyanê we, mêrê we an jî xizmên we, di nav malê de li hember we şîdetê bi kar bînin, mafê we heye ku hûn xwe biparêzin. Wek şîdet mirov dikare van tiştan bi nav bike: Tehda û azar dîtin, lêdan, birîndarbûn, gef û tehdît, hefsa odê, hêsîr girtin, bi riya zorê destavêtinên cinsî, tecawuz, mexdûrbûna tacîzê û/an jî bikaranîna tehda û azar an tacîz li ser zarokên we.

Ger mêr an jî hevjiyanê we li ser we şîdeta bedenî an jî cinsî bikar bîne, ev tawaneke polîsî û dadî ye û divê di çarçova cezayê giran de bê dadgeh kirin (wek birîndar kirin, tehdîta li ser azadiyê, tawana li hember kesayetîya cinsî).

Em dixwazin bi riya vê namilkeyê ve wek mexdûr, her weha wek xizm, cîran, pisporê alîkariya civakî û pisporê dezgeha tendurustiyê, endamê alîkariyê yê ciwanan an jî wek memûrê dewletê xwe bigihînin we û bi we re têkilî deynin.

Em dixwazin mafên we bi we bidin nasandin û her weha agahdarî bidin we, bi çî awayî li hember şîdeta di nav malbatê de hûn xwe biparêzin û bi çî awayî li dijî şîdetên dinê xwe û zarokên xwe biparêzin.

Di beşê 1.an de em dixwazin bi we bidin nasandin, ku çî derfet di destê polîs de heye û dikare we biparêze û pêşî lê bigre da ku hûn nebin mexdûrên şîdetê û her weha ji bo ewlekariya xwe û ya zarokên xwe hûn dikarin çî bikin.

Di beşê 2.an de em dixwazin li ser pêvajoya dadgeriya cezayê, rola we ya di vê dozê de û wek şahîd çî mafên we hene, agahdarî bidin we û bi we bidin nasîn ku ji bo bi destxistina zêdetir alîkari û xizmeta şêwirmendiya çî derfetên we hene.

Di beşê 3.an ya vê namilkeyê de jî, derfetên qanûna şarwerî cîh digrin, ku di çarçova wan de li hember şîdeta mêr/hevjiyanê xwe hûn dikarin xwe biparêzin. Wek mînak, hûnê bi riya dadgeriyê ve qedexekirina nêzîkbûna tawanbar ya li we an jî qedexekirina bikaranîna wî ya mala ku hûn bi hev re dijîn, fêr bibin.

Şîdeta di nav malbatê de çi ye?

“Şîdeta di nav malbatê de” tê vê wateyê: Tawanên ku wek şîdet tên pejirandin, ku di navbera kesên li gor şert û mercên li jê rêzkirî, jiyana xwe bi hev re didomînin (ji bilî giringiya cihê tawanê/herdu alî di malên cuda de rûnên jî) pêk tê:

- Bihevrejîyan hîn berdewam dike,
- Bihevrejîyan di asta veqetîne de ye,
- Bihevrejîyan qediya ye.

an jî

- Di navbera aliyan de têtîliya xizimiyê ya dereca yekemîn an jî têtîliya ku bi rîya zewacê pêk hatiye (tî, destgirtî tê de) heye (ji bilî tawanên ku li hember zarokan pêk hatine).

Şîdeta di nav malbatê de (ger tenê şahidê wê bin jî) dibe sedem li ser zîrar û ziyar dîtina mafê têtîşitina zarokan yên di nav aramiyê* ya qanûnî de.

* Binavkirina hevbeş ya Birêvebirîya Senatoya Wezareta Kar û Barên Navxweyî û Wezareta Werzîşê û Birevebirîya Senatoya Wezareta Dadmendiyê 10/2001

Parastina Polîsî

Di bin serweriya Polîsên Berlîne de, mêmûrên ku li ser şîdeta di nav malbatê de û tawanên cînsî hatine perwerde kirin û xwedî ezmûn in, kar û xebatên xwe bi rê ve dibin. Hûn dikarin bi rîya têtîfonê, li ser xeta **110**'an û 24 saet bê pere, bi polîs re têtîkîlî daynin.

Ger hûn ji polîs re têlefon vekin, van agahdariyan bidin wan:

- Gelo hûn di nav xeter û metirsiyek de ne û sedema vê xeter û metirsiyê kî an jî çi ye
- Ger hûn birîndar bin, ev birîndarî ji aliyê kê ve û bi çi awayî pêk hat?

Ger tawanbar cihê tawanê terk kiribe, agahdarî bidin polîsê:

- Gelo di demeke nêzîk de careke dine tehdîta şîdetê heye.
- Gelo çek an jî sîlaheke tawanbar heye?

Polîs, li ser agahdariyên we, wê biryar bide gelo mudaxaleyeke leztirîn pêwist e an na. Heta ku polîs were, di cihekî ewle de bisekinin. Wek mînak: di mala cîranek an jî di nav dikanek de, an jî di mala xwe de.

Li ser cihê ku hûn lê ne, agahdarî bidin polîsan.

Dema ku polîs hat, li cihekî ku tawanbar lê nîne, wê îfada we bigre û hûnê bikaribin li ser bûyerê polîsan agahdar bikin. Hûnê bikaribin di bin parastina polîsan de, bi zarokên xwe re cihê bûyerê terk bikin, da ku

- Di cihekî ewle de cîhûwar bibin (wek mînak hêwirgeha jinan),
- Hûnê bikaribin destek/alîkariya tendurustî werbigirin

an jî

- Birîn û şopên şîdetê bîna aşkera û dokument kirinê.

Ger hûn di bin xeter û metirsiyê de bin an jî tawanek pêk hatibe

- Li ser bûyerê polîsan bi berfirehî agahdar bikin. Da ku tedbirên pêwistî ji bo parastina we bîna girtin û şopa tawanbar bê ajotin,
- Li ser birînen ku nayên dîtin an jî bûyerên berê yêna birîndarkirî jî agahdarî bidin,
- Çiqas ji destê we tê, şahîdan nişan bikin,
- Ger derfet hebe, hacetên tawanê teslîmê polîsan bikin.

Polîs dikare tawanbar ji malê bi dûr bixe, dest deyne ser mifta malê, hatina wî ya malê qedexe bike. Ger xeter û metirsiyek hebe, ku tawanbar li hember we û/an jî zarokên we, careke din şîdetê bi kar bîne, dema bidûrxistin û qedexekirinê dikare heta 14 rojan bê dirêj kirin. Ji bilî vê, polîs dikare nêzîkbûn û têkilî danîna tawanbar, bi we û/an jî bi zarokên we qedexe bike. Ev qedexe dikare çend rojan berdewam bike û cihên ku hûn mecbûr lê bin jî dikare di nav vê qedexekirinê de bibe (wek cihê kar, hêlîn/dibistan).

Her weha, ger polîs nekaribe bi awayekî din pêşî li xeter û metirsiyên li hember we bigre, dikare tawanbar bigre û bavêje nezaretxanê. Reqema têlefonek bidin polîsê, da ku ew bikaribin bi we re tekilî deynin û we li ser dema serbest berdana hevjiyanê we, we agahdar bikin.

Ji bo parastin, derfetên yasayî û bidestxistina agahdariyên zêdetir û berfirehtir hûn dikarin bi Xeta Alîkariyê ya BIG'ê têkilî daynin. (Bergê pêşin mêze bikin). Ger hûn bixwazin karkereke jin ya BIG Hotline'ê bi we re bi rîya têlefonek têkilî dayne, polîs (bi destûra we) dikare reqema têlefona we bide Xeta Alîkariyê ya BIGê. Tê pêşniyarkirin ku (her çiqas polîs têkilî ne bûye jî) li gor Qanûna Parastina Ji Şîdetê (Gewaltschutzgesetz), di çarçova Qanûna Şarweriyê de hûn dikarin ji bo tedbirên dem dirêj serî lêdin. Wek mînak, mala ku hûn bi hev re dijîn, tenê ji bo we bê terxan kirin û qedexekirina nêzîkbûna we ya demdirêj (Binhêre beşa "îmkanên mafên sivîl").

Serlêdana gilîkirinê li cem polîs

Polîs, mecbûr e ku serlêdana we ya gilîkirinê qebûl bike. Serlêdanên gilîkirinê (bi devkî an jî nivîskî) ji aliyê cîran an jî xizmên we, ji aliyê polîs û ji aliyê we bi xwe jî dikare bê kirin. Ger ev pêk were, polîs agahdariyên li ser nasnama we wê qeyd bike. Bi tayabeti jî, ger hûn di bin xeter û metirsiyê de bibin, mafê we heye ku ne navnîşana xwe ya malê, navnişaneke din bidin, ku polîs bikare bi we re têkilî deyne. Ev dikare navnîşana parêzerê we, ya hevalekê we, ya dezgeheke alîkariye û hwd. bibe.

Di dema serlêdana gilîkirinê de, li ser bûyerên ku hatine serê we, agahdarî bidin. Polîs namilkeyek bi navê “Di Dozên Cezayê De, Mafên Mexdûr û Birîndaran” û reqema şopandina serlêdanê ya li ba dezgeha polîsan, wê bide we.

Di vê pêvajoyê de, wek şahîd wê îfade we bê girtinê. Da ku lêpîrsîna amadekariyê bighîje encamekê, divê ev yek bê kirin. Ger astengek derkeve û hûnê nekaribin di tarix û saeta kivşkirî de biçin, di wextê xwe de ji bo demeke nû serî lê bidin. Beriya ku îfade bidin, hûn dikarin ji parêzerek an jî ji dezgeheke alîkariyê xizmeta şewirmendiye bigrin. Di dema îfade dayinê de, parêzerê we an jî kesek din, ku hûn pê bawer in, dikare bi we re were û di dema îfade dayinê de jî li ba we bibe.

Ger hûn bi tawanbar re xizm, destgirtî an jî zewicî bin, mafê we heye ku şahîdiyê red bikin. Ango, hûn dikarin her dem biryar bidin, ku îfade nedin. Dosya çend salan wê bê parastin. Ger hûn biryar bidin ku di demeke pêş de îfade bidin, pêvajoya dozê dikare careke din destpê bike.

Ger hûn piştî girtina gilîkirinê careke din bi lêdan, xeter û metirsiyan ve rû bi rû bibin, divê hûn di zûtirîn wextî de parêzer, polîs, dozgerî û dadgehê agahdar bikin.

Ger êrîşa hevjiyanê we yê berê eşkere bibe, hûn dikarin alîkarîyê bigrin!

Balkêşî:

- Ji destpêkê pê ve li ser hemû şîdet, xeter û metirsiyên ji aliyê mêr/hevjiyanê we ve hatine kirin, agahdarî bidin.
- Ger tirsek we hebe, ku ji vir şûnda jî li hember we, zarokên we an jî kesên ku alîkariya we dikin, şîdet wê bê bi kar anîn, agahdarî bidin.
- Navên hemû kesan bidin, yên ku şahîdê bûyerê bûne an jî li ser wê hin tiştan bihîstine.
- Ger gengaz be (yên berê jî tê de) raporên bijîşkan yên li ser birîndarkirinê û encamê wê pêşkêş bikin.
- Ji bo ku ji bîr nekin, bûyeran binivîsin. Mijar û tiştên pêwîst (tarix, saet, şahîd), tehdîtên pey re, xeter û metirsiyan wek not binivîsin. Ev qeyd,

wê di pêşerojê de, li dadgehê kêri we bèn. Ger hûn birîndar bûne, hîn di dema serlêdana gilîkirinê de, îcaza agahdarî dayîne bidin bijîşkên xwe. Di vî warî de polîs forma pêwîst wê bide we.

Nojdarî (tedawî) û raporên bijîşkan

Ger hûn birîndar bûn, tedawiya xwe li ba bijîşkekî ewle pêk bînin. Ger hûn bi şîdeta di nav malbatê de an jî bi şîdeta cinsî rû bi rû bûn, ji bo ku hûn bikaribin birînen xwe bi belgeyî tespît bikin, zûtirîn wextî de biçin nexweşxanê an jî li ser bijîşkek (ger derfet hebe fotograf bikişînin). Di rewşeke weha de tiştê giring ew e ku, her çiqas ne rehetî peyda bibe jî, heta ku ev kar û xebat neqede xwe paqij nekin û serê xwe neşon. Kinc, bincilk û tiştên din, ku wê bibin şahîd ji bo şîdeta we dîtiye, têxin di nav tûrikên kaxizîn û teslîmê polîsê bikin. Ji bo birînen xwe, teqez rapor bistînin. Ev rapor, di dozên cezayî de ji bo tespîtkirina delîlan pir giring in. Ji bo pêvajoya dadgeriya cezayê zêdetir agahdarî di rûpela 11'an de ye.

Ger hûn biryara terka malê bidin

Ger hûn bi tenê an jî bi zarokên xwe ve malê terk bikin, hûn dikarin di stargeheke (malên taybet yên ji bo jinên mexdûrên şîdetê) jinan de cihek peyda bikin ku 24 saet bi ewletî li wir bicîh bibin (navnîşan, di rûpela dawiyê ya namilkeyê de ne). **Pê bawer bibin, ku tiştên bi riya postê wê ji we bê şandinê, bi ewletî bikevin destê we!** Hûn dikarin ji wir jî, mafê biryardayîna danişgeh û welîtiyê ji bo zarokan, serî li Dadgeha Malbatî lêbidin.

Beriya ku hûn malê terk bikin, belgeyên şexsî yên ku li jêr rêzkirî, bigrin cem xwe:

- Nasname/pasaportên we û yên zarokên we,
- Belgeyên zayina zarokên we/belgeya zewacê,
- Karta sîgorta tendurustiyê ya xwe û yên zarokan.

Ji bilî wan, tiştên ku divê hûn bi xwe re bibin:

- Belgeya destûra rûniştinê (îqame),
- Muqawela (kontrata) kirayê,
- Kontrata kar/danezana teqawitîyê,
- Nivîsarên navenda kar û xebatê û yên dezgehên civakî,

- Biryarên welîtiyê,
- Belgeyên hesabên banqayê,
- Derman,
- Tiştên şexsî yên we û yên zarokan (wek cil û berg, pêdiviyên hîjyenîk, lîstok, pirtûk û defterên dibistanê, rojnivîsk...)

Di dema pêş de, ger hewcedarîya we bi tiştêkî di mal de mayî hebe, polîs dikare (ger xeter û metirsî berde-wam dike) bi we re ware malê, da ku we biparêze.

Danezana navnîşana we ya nû û paras-tina cihê we yê nû

Li gor qanûnên Berlînê, divê hûn di nav 14 rojan de ji bo navnîşana xwe yê nû, qeyda xwe li Bürgeramtê çêbikin. Ger hûn hevjiyanê xwe, yê ku li ser we şîdetê bi kar tîne, veqetin û biçin xaniyeke din an jî di starge-heke jinan û her weha ger xeter û metirsîya we hebe, ku careke dinê bi şîdetê re rû bi rû bibin, serî li Bürgeramtê lêbixin, ku navnîşana we ya nû veşartî bigre.

Mirov bi çi awayî serî lêbixe, da ku agahdarî veşartî bimîne?

Hûn dikarin ji stargeha jinan an jî dezgehên wekî wê û Dezgeha Şêwirdariyê forma pêwîst peyda bikin an jî li ser kaxizekî daxwaznameya xwe binivîsin. Divê navê we, navê zarokên we, roja ji dayikbûna wan û navnîşana we ya nû di daxwaznameyê de cîh bigrin. (Ger hûn ji eyaletek din hatibin, bê derengî divê hûn serî li Bürgeramt'a berê bidin û ji wan daxwaz bikin ku agahdariyên we veşartî bimîne.)

Kargeha Hemwelatî û Pergalê ya Eyaletê (LABO-Landesamt für Bürger- und Ordnungsangelegenheiten) wê vekolîne bike, gelo ji aliyê yasayî ve rewşa we ji bo veşartina agahdariyan gengaz e an na. Ji ber vê yekê jî, divê hûn sedema serlêdana xwe bi eşkeretî terfî bikin. Di vê çarçovê de, wek mînak kî we tehdît dike, tiştên ku hatin serê we an jî bi çi awayî hûn hatin tehdît kirin, birîndarkirin, zirar û xesarên we dîtiye, dirêjahiya mexdûriyeta we çiqas e, sedemên tirsên xwe yên berbiçav (konkret) û hwd. eşkere bikin. Mînak, raporên bijîşkî, îfadeyên şahîdan, reqema ew-raqa serlêdana we wek delîl dikarin bên pêşkêş kirin.

Ger di destê we de delîlên wek wan tune bin, hûn dikarin ji nivîsgehên me yên şêwirdariyê wan bi dest bixin (li beşê navnîşanan mêze bike). Ger biryar bê dayîn ku agahdariyên li ser we bîna veşartin, bi dema wê ve (nîv sal, salek) bi nivîskî hûnê bîna agahdarkirin. Baş bala xwe bidin vê demê, ji ber ku bi xilasbûna demê ve veşartina agahdariyên we jî wê bi dawî bê. Ji bo dirêjkirina demê erkên pêwîst divê hûn bi xwe bi cîh bînin. Ji bo vê yekê, divê LABO li ser berdewamiya xeter û metirsiyê û sedemê wê bê agahdar kirin.

Divê hûn serî lê bidin, da ku mafên cihê danişgehê ji bo zarokên xwe bi dest bixînin. Ger serî lê nedin, veşartina agahdariyan wê ji bo zarokan derbasdar nabin û bi vî awayî navnîşana we jî wê eşkere bibe.

Hûrgiliyên li ser parastina agahdariyan

Pîştî ku li ser parastina agahdariyên we biryar hat girtin, agahdariyên li navnîşana we tenê ji bo dezgehên fermî (dadgeh, Jugendamt û hwd.) bê dayîn. Ger ji aliyê kes an jî şirketên taybet bîna pirsîn, bi nivîskî wê ji we bê pirsîn, gelo dayîna navnîşana we ji bo wan guncaw e an na, an jî dayîna navnîşana we ji bo wan kes an şirketan dibe sedema xeter û metirsiyek bo we an na. Divê hûn van pirsan di wextê eşkere kirî de teqez bibersivînin. Ger hûn nexwazin navnîşana we ji bo wan bê eşkere kirin, divê hûn vê yekê bi sedemên berbiçav eşkere bikin. Ger pêwîst be, hûn dikarin bi kesên ku dixwazin navnîşana we bi dest bixin têkilî deynin û pêşî lê bigrin da ku ew navnîşana we nedin kesên din. Ger hûn vê pirsê ne bersivînin, LABO pê bawer bibe, ku hûn ne dij in ku navnîşana we bê eşkere kirin.

Doza Cezayê

Paş lêpîrsîna polîsê, ewraqên dozkirina we wê bighîje destê dezgehê an jî destê dozgeriyê. Li wir wê lêbikolin, gelo şert û mercên ji bo dozvekirinê pêk hatîye.

Paş lêpîrsînê piranî rê û rêzana li jêr rêzkerî guncaw e:

Red kirin/bi dawî anîna dozê

Ger dozger di wê baweriyê de be, ku ji bo ceza dayinê delîl têrê nakin, dozê red dike. Mafê we heye ku hûn, hember vê biryarê îtiraz bikin. Di vî warî de hûn dikarin ji dezgehên şewirdariyê yên ku bê pere xizmeta didin, agahdarî bi dest bixin (Li beşê navnîşanan mêze bike)

Vekirina dozê/Emirnama Cezayê

Ger dozgerî di wê biryariyê de be, ku delîl têrê dikin, serî li dadgeha rayedar dide, da ku doz bê vekirin an jî daxwaza emirnama cezayê dike.

Bi emirnama cezayê re, bê ku tawanbar beşdarê rûniştina dadgehê bibe, dadgeh dikare bi ceza pereyê an jî ceza hepsa paşxistin, ew ceza bike. Doz bi vî awayî diqede. Li ser encamê hûn nayên agahdar kirin, lê dikarin bi riya nivîskî ji dozgeriyê daxwaza agahdariyan bikin. Wek mexdûr hûn dikarin, hîn li dema serlêdana polîsan, ji wan daxwaza agahdariyên li ser encama dozê bikin.

Pêvajoya dozê

Dadgeh, li ser pejirandin an ne pejirandina dozê biryar dide û dema dadgehkirina bingehîn destnîşan dike. Wek şahîd bang li we, li şahîden din û li tawanbar dike.

Piranî, rûniştina bingehîn, piştî serlêdana gilîkirinê, di nav salek de pêk tê. Di rûniştina bingehîn de ji we careke din tê xwestin, ku bûyerê bi berfirehî vebêjin, ji ber ku divê dadgeh, piştî girtina îfadeyên devkî yên hemû aliyan biryara xwe bide. Lijneya dadgehê, dozger û parêzerê dozlêkirî jî, dikarin ji we hin tiştan bipirsin. Ger hûn biryar bidin ku îfade nedin, ango ger hûn mafê ne axaftinê hilibijêrin, îfadeyên ku we berê dabûn, ji aliyê dadgehê ve wê neyên li ber çav girtin. Di encama vê de jî –ger delîlên din jî tunebin- wê tawanbar bê serbest berdanê û ceza jî nagre. Ji kerema xwe re ji bîr nekin: Ger dozlêkirî ne girtî be, wê bikaribe di nav awahiya dadgehê de serbest bigere. Ger tirsê we hebe, ku hûn wî bibînin, heta dema îfade dayinê hûn dikarin di odeyê şahîdan ya parastî de rawestin. Ger daxwazeke we ya bi vî awayî hebe, beriya dozê dadgehê

agahdar bikin (reqema têlefona wan li ser gazînameyê (celp) de heye) û serî li nivîsgeha pejirandina şahîdan bidin (li beşe navnîşanan mêze bikin). Wek prensîp, di dema rûniştinê de kesên dozlêkirî amade dibe. Lê belê, di dema şahîdiya we û di hin şert û mercan de, kesên dozlêkirî dikare bê liderxistin. Rûniştina bingehîn ji raya giştî re vekirî ye (lê belê, di hin şert û mercan de dikare rûniştin ji bo wan veşartî bê li dar xistin). Kesên ku bawerîya we pê hebin, dikarin bi we ra bên dadgehê. Lê divê dema îfade girtina we de, ev kesana di cihê guhdaran de rawestin. Lê belê hûn dikarin serî lê bidin û daxwaz bikin ku ew li cem we rûnên. Dozger, piştî îfadeya dozlêkirî, yên şahîdan û hin rewşan de yên pisporan, agahdariyan berhev dike û daxwaza cezayê dike.

Ger parêzerê we hebe, ew bi tenê dikare bi navê we, li ser bûyeran bipeyive. Ger ev pêk were, di dawîyê de berê parêzerê dozlêkirî, paşê jî dozlêkirî bi xwe dipeyive. Piştî wê jî dadgeh, wek agahdariyên li jêr rêzkirî, birayara (daraz) xwe dide:


- Dayina ceza pereyê an jî
- Dayina ceza hepsê ya paşxistina wî guncaw e û bi vê ve girêdayî û gengaz e
- Wezîfa beşdarbûna kursa perwerdekirinê ji bo tawanbar an jî
- Ger dîtina dadgehê ew be ku delîl ji bo mehkûmkirinê têrê nakin, beraet kirin.

Lê belê, doz di çarçova rûniştina bingehîn de jî –wek bi dayina cezayê pere- dikare biqede. Di her merhelê de îmkana we heye ku serî li parêzerekî ewle bidin, bi wê bişêwirin û wekalet bidin wî. Di vî warî de parêzerê we beriya rûniştinê li dosya we mêze dike û di dema îfadegirtina we ji li cem we dibe. Bi piranî mesrefan divê hûn bi xwe bidin. Di vî warî de parêzerê we dikare agahdarîyan bide we.

Dadgeh, di hin şert û mercan de, destûr dide ku hûn wek mûdaxîl beşdarî dozê bibin. Bi vî awayî, wek şahîd û mexdûrekê bûyereke şidetê (ya berê) li hember mêr/hevjîyanê xwe hûn dikarin xwedî maf û derfetên berfireh bibin.

Dadgeh rê dide, ku hûn wek şahidê dozê, serî ji bo alîkarîya mesrefên dadgehê bikin. Li ser Navendên Şêwirdariya Jinan hûn dikarin bi parêzêrên jin ku di wan navendan de xizmeta şêwirmendiyê ya bê pere didin, têkilî daynin. (berê bi rîya têlêfonê ji wan (randevu) bigrin). Di çarçova dozê di her warî de (wezîfedarkirina parêzeran, alîkari ji bo mesrefa dadgehê, pêvajoya dozê, îmkana parastinê, di çarçova doza cezayê de daxwaza tezmînata madî hwd.) pirs bi giştî dikarin bên eşkere kirin.

Pirsiyariya cezayê – mînakek



Îmkanên Parastinê li gor Yasayê Sivîl

Ger hûn (an jî zarokên we) bibin mexdûrên şîdeta di nav malbatê, an jî taciza berdewamî, hûn dikarin ji dadgehê daxwaza tedbîrên parastinê bikin. Her usa ji wan daxwaz bikin, xaniyên ku hûn tê de bi hev re rûdinên, bi tenê ji bo we bê terxan kirin. Di vî wari de Dadgehên Malbatî rayedar in. Li gor Qanûna Parastina ji Şîdetê, di destnişankirina dadgeha rayedar de vebijarkên jêrîn derbasdar in:

Qada erka dadgehê

- Cihê qewimandina bûyerê werdigre,
- Navnîşana mala bi hev re jîyanê werdigre, an jî
- Navnîşana danişîna dozlêkirî werdigre.

Di dozên terxankirina hawirgehan de li gor §§ 1361 b, 1568 a BGB an jî §§ beşên 14, 17 dadgehên rayedar ne li gor daxwazan, lê li gor diviyatiyan, wek li jêr rêzkirî, tên diyar kirin:

Dadgeh

- Dadgeha ku doza zewac an jî bi hev ra jiyana li wir destpê kiriye, an
- Dadgeha navnîşana mêr û jin an jî kesên ku bi hev ra dijîn an jî
- Dadgeha navnîşana dozlêkirî lê ye,
- Dadgeha navnîşana dozdar lê ye.

Ji ber ku zarokên we ne di çarçova Qanûna Parastina ji Şîdetê de ne, heman serlêdan divê li gor §§ 1666 û 1666 a BGB ji bo zarokên we jî pêk were. Dema ku zarok 14 salî bûn, dikarin serlêdanên bi vî awayî bi xwe pêk bînin û wekalet bidin parêzeran. Ji bilî pêvajoya dozê de, ger lezgin be, ji bo girtina biryarên demî, ew bi xwe jî dikarin serî lêbidin. Di rewşên lezgin de, ev rîya bi lez û kêr lêçûn tê bikaranîn. Divê sedema serlêdanê bê eşkere kirin û divê bawerî pê hebe, ku ji bo biryareke bi vî awayî şert û merc guncaw in. Divê ji bo baweriyê delîlên berbiçav bînin nîşan kirin û ifadeyên sondxwarî bînin dayîn. Qanûn, beriya ku biryar bê dayîn, bi giştî daxwaza berhevkirina delîlan ango delîlên berbiçav dike, ji ber vê yekê

jî, delîlên ku di dema serlêdanê de an jî di rûniştina ku îfade tê girtin de wê bên peşkêş kirin, bi taybetî jî şahîdan bi xwe re bînin!

Di dema îfade dayinê de, ger ji sedemên pirs-girekên di navbera we de îhtîmala hevdişîneke metirsîdar hebe, ji bo pêşîlêgirtina rewşeke weha, hûn dikarin daxwaz bikin, ku doz lê kirî di ciheke cuda de bê girtin. Lê belê divê hinceta vê daxwazê bawerker bibe.

Hûn dikarin hîn ji dadgehê daxwaz bikin:

- Tezmînata madî û ya arişî, (Dadgeha Sivil)
- Li gor §§ 823, 1004 BGB, ewlekariya tevayî ji bo parêzîya şexsî,
- Wergirtina welîtiyê (Dadgehên Malbatî),
- Qedexkirina mafê dîtinê (Dadgehên Malbatî)

Di vi warî de, ger hûn li parêzerek pisporê Hiqûqa Malbatî bişewirin/wekalet bidin wî, wê baştir bibe. Ger qazanca we têrê neke, hûn dikarin ji bo alîkariya şewirmendî/lêçûna dadgehî derfet bigrin.

Ji ber ku pêvajoya doz û darazê pir wext digre, divê hûn bi riya rûniştina lezgîn, li ser tedbîrên parastinê û mafên xwe yê din yê li gor qanûna şarwerî biryar derbixin. Formên ku di vî warî de karê we hêsantir bike, ji Navendên Şewirmendiyê ya Jinan an jî li ser înternetê www.big-koordinierung.de/Schutzantrag/ dikarin bên bi dest xistin.

Cîbicîkirina tedbîrên parastinê

Dadgeh dikare li gor Qanûna Parastina ji Şîdetê § 1 û qanûna li ser zarokan BGB § 1666, biryara qedexekirina tevgerîna xirab, xeter û metirsîyên wî, ne rehetkirina wî, têkilî danîna wî (nêzîkbûna wî ya şexsî jî tê de) bide. Dikare biryara qedexirinê ya têkilî danîna tawanbar ya bi we re, nêzîkbûna wî ya ji bo cihê kar yê we, mala we an hêlîn yan jî dibistanên ku zarokên we diçin, bide. Li ser van biryaran li gor § 1 GewSchG agahdarî ji bo polîsan tê dayîn. Ger wî yek ji wan biryarên ku di çarçova § 1 GewSchG de hatine dayîn binpê bike, ev tê wê wateyê ku ew tawanbar e. Hûn dikarin bang li polîsan bikin û gilîdar bibin.

Di hin rewşên awarte de polîs dikare wî bigre û bavêje nezaretê.

Terxankirina mala ku berê bi hev re lê dijîyan

Hûn dikarin li gor § 2 GewSchG ji Dadgeha Malbatî daxwaz bikin, ku mala berê ya ku we bi hev re lê jîyan dikir, tenê ji bo we bê terxan kirin. Ev biryara terxankirinê li leha zarokên we li gor § 1666 BGB jî dikare bê girtin. Ger hûn zewicî bin, li gor § 1361 b BGB, an jî ger wek hevjiyan bi yekî re dijîn, li gor Qanûna Hevjiyanê § 14, hûn dikarin daxwaz bikin, ku mala ku hûn bihev re dijîn, ji bo we were terxan kirin.

Şert û mercê vê biryarê ev e, ku hûn daxwaz bikin ku jiyana xwe ji wî cuda berdewam bikin û divê pêwîst bê dîtin, ku biryara terxankirina malê pêşî li “astengên badilhewa” bigre. Terxankirina malê ji bo we, di he-man demê de dikare encama biryardayîna fesihkirina muqawela (kontrata) kirê ji aliyê tawanbar ve bi xwe re bîne û her weha dikare biryar bê dayîn ku wî nikaribe hewl bide ku jiyana rojane ya di nav malê de ji bo we zehmetiyan derxe. Ger muqawela kirê li ser navê we be û ger hûn bê zewac bi hev re dijîn, hûn dikarin ji Dadgeha Malbatî daxwaz bikin ku aliyê din malê vala bike. Ger muqawela kirê li ser navê we herduyan be, li ser biryara valakirina aliyê din ya malê hûn divê bi parêzerê xwe ve bişêwirin. Derfet heye ku di her şert û mercan de hûn bikaribin mafê bikaranîna malê ji bo demekê bi dest bixin. Ger muqawele li ser navê tawanbar be jî, ev derfet heye. Her weha, biryara qedexekirina hatina wî ya malê, tevgerîna xirab, tehdît kirin, ne rehet kirin, têkilî danîn (nêzikbûna şexsî ji tê de) li gor § 1 GewSchG her dem di rûniştinên lezgin de dikare bê girtin. Dive hûn ji bîr nekin; ger dadgehek li gor GewSchG ku di rûniştineke bê devkî de hin biryar bidin, divê ji aliyê memûrekî îcrayê ve ev biryar ji bo we bê teblîx kirin.

Ger daxwaza we ya alîkariya lêçûnên dadgehî bê pejirandin, lêçûnên teblîxata ewilîn li gor GewSchG li gel serlêdana xwe rabigihînin. Biryarên ku li gor § 2 GewSchG têne girtin, ji bo polîs û Kargeha Ciwanan jî tê ragihandin.

Mafê welîtiyê

Ger zarok di cihên ku şîdet tê de hene mezin bibin, ev yek her dem bandorên pir xeter li ser jiyana wan de dihêle. Ger hûn bixwazin ji sedemên tevgerînên wî yên xirab ji mêrên xwe veqetin an jî ger hûn ji bo parastina ewlehiya xwe ya şexsî bi biryara dadgehê serî li dadgehê bidin, ji bo ku têgihîştina zarokên we zirar nebîne, hûn dikarin serî li Dadgeha Malbati bidin û ji wan daxwaza bi dest xistina welîtiya demî an ya misoger bikin. Serlêdana we ya hevberdanê bibe an nebe, mafê we heye ku hûn vê daxwaz bikin. Dadgeh jî, ji bo ku pêşi li xeteran bigre, divê li gor daxwaza we biryar bide. Her weha li gor §§ 1666, 1666 a BGB, dikare bikaranîna malê ya ji aliyê tawanbar û têkilî danîna wî qedexe bike, mafê biryar dayinê ku hûnê li ku bijîn, ji destê wî bigre û hwd.

Mafê hevdîtinê

Ji bilî mafê welîtiyê, piranî mafê bav heye ku zarokên xwe bibîne. Ger xetera bikaranîna şîdetê li ser we an jî li ser zarokên we hebe, an jî îhtimal hebe ku zarok şahîdê şîdetê bin û tendurustiya wan xirab bibe, hûn dikarin daxwaz ji Dadgeha Malbatî bikin, ku mafê hevdîtinê ji bo demekî an jî misoger ji destê wî bên girtin. Dadgeh piranî, çareseriyekê lihevkinê dibîne û mafê hevdîtinê ya di bin çavderiyê de dide. Ger weha be, hevdîtin di bin çavderiya yekî ewle an jî ya xebatkarekî kargeha ciwanan an jî dezgehek wek wê tê pêk anîn. Ger berê, demekî dirêj bi zarokan re di nav heman malê de jiya bin û ji bo ku bandoreke erênî li ser tendurustiya zarokan bihêle, ev ji bo zirbavan jî guncaw e (mêr an jî hevjiyan). Ger zirbav/hevjiyan li ser we an jî li ser zarokên we şîdetê bikaranîbe, hûn dikarin daxwaza sînorkirin an jî qedexekirina mafê hevdîtinê bikin an jî ji dadgehê daxwaz bikin, ku biryar bide da ku hevdîtin di bin çavderiyê de bê pêkanîn (bi amade bûna kesêkî din). Ger bandoreke erênî li ser têgihîştina zarokê bike, mafê bapîr û dapîran jî heye ku zarokan bibînin. Di vî warî de dîtina bav û diya bavê zarokan ya li ser meyla kurê xwe yê şîdetê divê bê zanîn. Ger ew, xetera ku kurê wan pêk tîne nebînin û ev xisleta wî li ber çavan negrin, divê hevdîtinê wan jî bê sînor an qedeqekirin an jî divê ew jî di bin çavderiyê de zarokan bibînin da ku tendurustiya zarokan nekeve xeterê.

Ger hûn ji ber meyla mêr/hevjiyanê we ya şîdetê biryara qedexekirina wî ya hatina malê, tevgerîna xirab, tehdît kirin, ne rehetkirin, têkilî danîn (nêzîkbûna şexsî jî tê de) bi dest bixin, bi parêzerê xwe re bişêwirin, gelo ji bo serlêdana qedexekirina hevdîtina tawanbar derfeta serlêdanê heye an na. Heta ku mafê wî yê hevdîtinê hebe, ne gengaz e ku pêşî lê girtin da ku tawanbar di dema teslîmkirina zarokê de nêzîkî we bibe an we ne rehet an jî tehdît bike. Ger li ser mafê hevdîtinê biryareke dadgehê ya berê hebe, di dema serlêdana parastinê de li ser vê jî agahdarî bidin dadgehê û ji wan daxwaza jinûvekirina ve biryarê bikin. **Hûn dikarin di vî wari de agahdariyên berfirehtir di namilkeya “Begleiteter Umgang” yê BIG e. V. bi dest bixin.**

Rê û rêzana dadgeriyê li ser babetên bi zarokan re têkildar in

Ji 01.09.09'an vir de, Qanûna Babetên Di Bergeha Dada Jidil ya Dadgeha Malbatî (FamFG) merî ye. Bi wê ve girêdayî pîvanên jêrîn derbasdar in:

Babetên pêşdatir divê bilez bidawî bibin (§ 155 FamFG):

Pirsgirêkên wek kivşkirina cihên zarok wê lê bijîn, mafê hevdîtinê û teslîmkirina zarokan, xetera li ser têgihîştina wan ya bi rêk û pêk (§§ 1666, 1666 a BGB), divê beriya dozên hiqûqa malbatî yê din û bi leztir bidawî bibin. Li gor vê, li pey tarixa ku doz hatiye vekirin derengtirîn di nav mehekê de roja rûniştinê divê bê îlan kirin. Daxwaza paşxistinê ya herdu aliyan, divê tenê di mercên awarte de bîn pejirandin. Sedema daxwaza paşxistinê divê bawerker bibe!

Di rûniştinê de herdu alî (ger hebin, bi parêzerên xwe ve), nûnerê Kargeha Ciwanan û ger pêwîst be şêwirdarê zarokan yê bo rûniştinan (Verfahrensbeistand) ku divê beriya rûniştinê bangkirî be, divê amade bibin. Pir caran ne pêwîst e, ku zarokên ji 14 salî piçûktir, amade bibin. Ev rûniştin, di wextekî nêzîk yê bûyera şîdetê de pêk were, dibe ku ev yek, ji aliyê giyanî bandoreke neyînî li ser dayikên ku mexdûrê şîdetê bûye, bihêle û îfade girtina herdu aliyan li cem hev, ji aliyê ewlehiyê de xeternak bibe. Ger daxwaza paşxistin

û îfade girtina ji hevdu cuda bê kirin, divê sedem eşkerekere û bawerker bibe. Bi awayeke fambar bidin zanîn, ku hûn di bin metirsiya şîdetê de nav malbatê de ne.

Di dema ku hûn di dadgehê de îfade didin, bi wan bidin zanîn ku di navbera dayina mafê hevdîtînê û Qanûna Parastina ji Şîdetê de nakokî heye. Banga bi tawanbar re di Dezgeha Ciwanan (Jugendamt) de hevdu dîtin dikare ji bo we xeternak bibe û dijî biryara parastinan bibe. Divê Jugendamt di pêvajoya dadî de, dîtînên xwe eşkere bike û ger daxwaz bê kirin, divê bibe aliyek dozê. Ger weha biryar bê dayîn, êdî pêwîstiya dîtina nîvîskî namine.

Hewldanên ji bo lihevkerinê (§ 156 FamFG):

Di dozên wek mafê welîfî û kivşkirina hawirgeha bicîhbûne, mafê hevdîtînê, teslimkirina zarokan de, divê dadgeh

- Hewl bide ku lihevkerin pêk were
- Bi taybetî di warê welîfî/girtina berpirsiyariyê de, ji bo lihevkerinê derfetên girtina şewirdariyê pêşkêş bike
- Divê derfetên navbeynkariyê pêşkêşî herdu aliyên bike.

Ew dikare

- Cî bi cîkirina şewirdariyê
- Ji bo lihevkerinê, hevdîtin pêk werin.

Tiştên pêwîst

- Ger lihev nekin, divê biryarên demî li ber çavan bigre.

Divê dadgeh, li ser girtina şewirmediyê biryar bide an jî ger li ser pêwîstiya rapora pisporan biryar da, divê li ser mafê hevdîtînê jî biryareke demî bide an jî wê qedexe bike. Di bûyerên şîdetê de nav malbatê de, ji ber ku piranî xalên ku herdû alî li ser wan lihevkerine nayên sepandin, dadgeh ji aliyê lihevkerinê de hewl nade.

Tezmînata madî û arîşî

Mafê tezmînata madî tê wê wateyê, ku zirar û ziyana ku we dîtiye û lêçûnên bijîşkî, wendakirina hatina we, cil û berg û kel û melên we yê xesar dîtine, divê

bên tezmîn kirin. Li gor mafê tezmanata manewî jî, eza û cefayên ku we kişandiyê, birîn û keserên we, binpêkirina rûmet û şerefa we divê bên tezmîn kirin.

Li kî derê dikarim hîn tiştan bibînim?

Dadgehên malbatî:

Pankow/Weißensee

Taxên ku lê berpirsiyar e:

Mitte (Mitte, Tiergarten, Wedding),
Pankow (Pankow, Weißensee, Prenzlauer Berg),
Reinickendorf

Kissingenstr. 5–6

13189 Berlin-Pankow

Tel.: 9 02 45-0

Ji bo agahdarî û serlêdanê:

Qata Jêzeminê, Oda B2

Schöneberg

Taxên ku lê berpirsiyar e:

Steglitz-Zehlendorf û Schöneberg

Grunewaldstr. 66–67

10823 Berlin-Schöneberg

Tel.: 9 01 59-0

Ji bo agahdarî û serlêdanê: Oda 11

Tempelhof-Kreuzberg

Ji bo hemû taxên din rayedar:

Hallesches Ufer 62

10963 Berlin-Kreuzberg

Tel.: 9 01 75-0

Ji bo agahdarî û serlêdanê:

Odayên F020–F029

Demên kar û xebat, agahdarî û serlêdana dadgehên:

Duşem – Çarşem di navbera 8.30–15.00'an de

Pêncşem di navbera 8.30–18.00'an de

În di navbera 8.30–13.00'an de

Ji bilî wê, di Amtsgericht Tempelhof – Kreuzbergê de, di rojên Şemiyên, navbera 9–12.00'an de, ji bo dozên malbatî û dozên hiqûqî yê giştî dadgeheke nobedar kar û xebatên xwe didomîne.

Dadgeha Cezayê:

Tiergarten, Tel.: 90 14-0

Stargehên jinan:

- Deriyên stargeha jinan, ji bo jinên hemwelatîyên hemû dewletan re vekirî ye, jin dikarin bi zarokên xwe re ji bo demekî li wir bicîh bibin.
- Hûn dikarin şev û roj ji stargeha jinan re têlefon vekin.
- Navnîşanên stargeha jinan veşartî ne.
- Zîlam nikarin bikevin stargeha jinan.
- Hûn dikarin bê pere di stargeha jinan de bimînin – Xwarin û vexwarina xwe û ya zarokên xwe divê hûn bi xwe peyda bikin.
- Di stargeha jinan de bi berfirehî xizmeta şewirdariyê û alîkarî tê dayîn.
- Ji bo mayîna di stargeha jinan de hevberdan ne pêwîst e, ger hûn li wir bimînin, navên we ji bo Kargeha Biyaniyan nayê dayîn.

2. Autonomes Frauenhaus, Tel.: 37 49 06 22

Hestia-Frauenhaus, Tel.: 559 35 31

4. Autonomes Frauenhaus, Tel.: 9161 18 36

Frauenhaus BORA, Tel.: 986 43 32,
Ji bo astengdaran odayên taybet

Frauenhaus CARITAS, Tel.: 851 10 18
Ji jinên ku nabihên re derfetên guncaw hene

Interkulturelles Frauenhaus, Tel.: 80 10 80

Therapeutische Frauenwohngemeinschaft Bora,
Tel.: 97 99 96 46

Xizmeta şêwirdariyê û saziyên dewletê yên ku hûn dikarin jî wan alîkarî bigrin

Ji bo jinên mexdûrên şîdeta di nav malbatê de, bi riya tîlefônê û bi riya hevdiîtina rû bi rû xizmeta

- Şêwirdariya civakî û huqûqî
- Agahdarî li ser tedbîrên polîsî û qanûnî
- Alîkarî li ser stargeha jinan
- Alîkarî di kar û xebatên li gel sazî û dezgehên dewletê de, alîkari ji bo peydakirina xaniyek
- Şêwirdariya hiqûqî, çareseriyên komî, xwedîkirina zarokan hwd.

Frauenberatungsstelle Tara, Tel.: 787 18 340
Şêwirdariya bi Înglîzî, Farsî û Tirkî

FRAUENRAUM, Tel.: 448 45 28
Şêwirdariya bi Înglîzî

Frauenberatung BORA, Tel.: 927 47 07
Şêwirdariya bi Înglîzî, Fransî, Farsî, Lehî, Rûsî

Frauentreffpunkt, Tel.: 622 22 605
SMS: 0151-567 40 945
Şêwirdariya bi Înglîzî, Lehî, Spanî û zimanê Îşarkî

Interkulturelle Beratungsstelle, Tel.: 80 19 59 80
Şêwirdariya bi zimanê Ermenî, Înglîzî, Fransî, Sirbî, Farsî, Lehî, Spanî, Rûsî, Tirkî. Cihê taybet ji bo tîketina xaniyê bo astengdaran

Malên hêwirînê

Frauenzimmer e.V., Tel.: 787 50 15,
Ji bo yên ku erebeya astengdaran bikar tînin guncaw e

Hestia e.V., Tel.: 440 60 58

Zuff e.V., Tel.: 694 60 67

Frauenort-Augusta, ji yên ku nabihên re gunçaw e
Tel.: 28 59 89 77 û 46 60 02 17
Fax 28 59 89 78 û 46 60 02 18
SMS: 0160-666 37 78

Interkulturelles Wohnprojekt, Tel.: 80 10 80 10
Hûn dikarin ji navnîşanên li jêr rêzkiîrê bê pere
şêwirdariya hiqûqî û alîkari bigrin:

Derfetên bi dest xistina şêwirdarî û agahdariyan li ser babetên kivşkirî

LARA, Tel.: 216 88 88 (Hotline)
Navenda şêwirdarî û krîzê ya ji bo jinên mexdûrên
tecawûz û tacizê cinsî

Wildwasser e.V., Tel.: 693 91 92
Şêwirdarî û alîkariya ji hevûdin re ji bo jinên ku di
zaroktiya xwe de bûne mexdûrên tacizên cinsî

FrauenNachtCafé – Navenda destekê ya bi şev vekirî ye –

Tel.: 61 62 09 70
Kreuzberg, Friesenstrasse 6,
Demên kar û xebatê:
În – Şemî bi şev di navbera 20 -2'yan de
Şemî - Yekşem bi şev di navbera 20 -2'yan de
Çarşem - Pêncşem bi şev di navbera 20 -2'yan de

Netzwerk behinderter Frauen in Berlin e.V.

(network for disabled women in Berlin),
Tel.: 617 09 167/617 09 168

Ban Ying, Tel.: 440 63 73/74
Navenda şêwirmendî û koordînasyonê ya bazirganiya
mirovên

Al Nadi, Tel.: 852 06 02
Navenda şêwirdarî û hevdîtinê ya ji bo jinên Erebb

HINBÛN, Tel.: 336 66 62

Navenda şêwirdarî û perwerdehiyê ya ji bo jinên Kurd

In VIA, Tel.: 86 42 48 50

Navenda şêwirdariyê ya ji bo jinên Ewropa Navendî û
Rojhilatî

TIO, Tel.: 612 20 50

Navenda agahdarî û hevdîtinê ya ji bo jinên Tirk

EWA Frauenzentrum, Tel.: 442 55 42

Şêwirdarî di warê hiqûqî û giştî de

NAVENDÊN ALÎKARIYA LEZGÎN JI BO ZAROKAN

Bi şev û roj hûn dikarin têlefona bikin

Kindernotdienst, Tel.: 61 00 61

Jugendnotdienst, Tel.: 61 00 62

Mädchennotdienst, Tel.: 61 00 63

Li ser van hersê numarayên têlefona hûn **dikarin
24 saet bi xeta destek a parastina zarokan a li
Berlînê têkilî deynin.**

Navendên şêwirdariyê yên ji bo parastina mexdûr û şahîdan:

Opferhilfe, Tel.: 395 28 67

Navenda şêwirdariyê ya ji bo mexdûrên tawan

**Navenda parastina şahîdan ya dadgehên
Amtsgericht Tiergarten û Landgericht Berlin**

Oda B 020/21, Wilsnacker Str. 6, 10557 Berlin

Tel.: 90 14-34 98/90 14-32 06

AHGATA – Hilfe für die Zeugin, Tel.: 440 526 00

Nivîsgeha refaqeta şahîdyan, alîkariya şahîdên jin û
amadekariya rûniştinan

www.ahgata.de

Weißer Ring, Tel.: 833 70 60

Wildwasser e. V., Tel.: 2 82 44 27

Berlin-Mitte navenda şêwirdariyê ji bo keçan. Xizmeta refaqeta şahîdiyê ji bo keçên mexdûrên taciza cinsî yên biryar dane ku gilfdar bibin.

Tauwetter, Navenda alfkariyê ji bo mêrên ku di zaroktiya xwe de bi taciza cinsî rû bi rû bûne

Tel: 6 93 80 07, Sêşem di navbera saet 17 – 18'an û Pencşem di navbera saet 17 – 19'an de

Navenda şêwirdariyê ji bo tawanbarên şîdeta di nav malbatê de

Beratung für Männer – gegen Gewalt

Tel.: 785 98 25, Mobil: 0170/380 18 14

Berliner Zentrum für Gewaltprävention – BZfG e. V. (Navenda Pêşîlêgirtina Şîdetê li Berlînê)

Tel.: 23 45 79 02

Navendên şêwirmendiyê ji bo yên ku meyla wan li ser nasnamên cuda yên cinsî ne:

Lesbenberatung

Tel.: 217 27 53

Maneo

Şêwirmendî ji bo gay û bîseksuelan

Tel.: 216 33 36

Her roj di navbera saet 17–19'an de

Xeta navendî ya şewirmendiya ewil a bi tefone li Berlin BIG HOTLINE

BIG HOTLINE



030.611 03 00

Alîkarî ji bo jin û zarokan li dijî şideta di nav malbatê de

Her roj –di dawiya heftê û rojên betlanan (tetilan) jî tê de, 24 saete li ser kar e. Ger pêwîst be, wergêrên jin tîn wezîfedar kirin.

Jinên ku di BIG Hotlinê de kar dikin, xizmeta şewirmendiyê didin jinên mexdûrên şideta di nav malê de û kesên derdorê wan. Ger kesên pispor ji bo kar û xebatên xwe yên li ser şideta di nav malê de hewcetiye bibînin, BIG Hotline xizmeta şewirmendiyê dide wan jî. Karkerên BIGê, wek mînak di warê şewirmendiya pêşîlêgirtina krîzan, bicîhkirina li stargehan an jî di hawirgehên din, kar û xebat dikin. Ji bilî wan, li ser alîkariya polîsî û dadî agahdarî didin. Her weha, ger desteka bi riya tefone têrê neke, xebatkar dikarin bî cihê ku hûn lê ne û li wir jî xizmeta şewirdariyê bidin we.

Navendên ku alîkarî û şewirdariya pisporî ya BIG Hotlinê lê hene: Frauentreffpunkt, Frauenraum, Tara, Bora û Interkulturelle Initiative.

Şideta di nav malê, tişteke bi şexsî nîn e!
Ji bo xwe û ji bo zarokên xwe alîkarî werbigrin.

030.611 03 00